

Rapora Hammarberg li ser mafê mînorîtetan li Turkiyê

Komîsyonerê Konseya Ewropayê Thomas Hammarberg ku ji pirsên mafê mirovan mesûl e, dûhî (1/10-2009) rapora xwe ya li ser mijara mafê mînorîtetan li Turkiyê belav kir.

Hammarberg berî nuha çûbû Turkiyê li çend bajaran li ser pirsên mafê mirovan kûr bûbû.

Hammarberg xemgîniya xwe eşkere, li ser fêmkirin û tercûmekirina Turkiyê li ser hebûn û mafê mînorîtetan li welêt, anî zimên ku Turkiyê çima tenê ermenî, grekî û cuhûwan weke mînorîtet nas dike. Wî daxwaz kir ku diyalogek ji dil bi tevayê mînoretan re bê danîn.

Piştî serdana Hammarberg, rejîma Turkiyê ji bo pêşxistina diyalogê bi rêvebirên kurdan, mînorîtet û baweriyên din re dest bi danûstandinê kir. Gava Turkiyê ji aliyê komîsyoneran ve erênî hate dîtin û pêşwazîkirin.

Hammarberg xemgîniya xwe li ser kêmkirin û sînorkirina mafê baweriyên cewaz li Turkiyê anî zimên. Wî daxwaz ji rêvebirê dewletê kir ku, pirçandîbûn dewlemdî ye û piralî fêda xwe heye, divê ev rastî di nava xelkê de bê belavkirin. Hammarberg bala rêvebiran kişand ser pirsên parastina mafê mal û mulkên mînorîtetên nemihemedî û xwest ku, qanûnên Turkiyê li gorî yên Yekîtiya Ewropayê bêne serastkirin.

Rapor balê dişîne ser kurdên muhacirbûyî li Turkiyê û daxwaz ji Turkiyê kir ku bi zutirîn wext birînên wan derman bike, ji bo vegeerê bibe alîkar, mafê wan biparêze anjî li cihê lê ne, bibe alîkar.

Komîsyoner Hammarberg xwest ku, sîstema parastina gundan (Koy korucusu) ji holê bê rakirin û di şûna wê de gavên erênî bê avêtin.

Di dawiya raporê de pêşniyarên Hammarberg hene ku bi giştî ji bo parastin, pêkanîn û çavdêriya mafê mirovan li Turkiyê qanûnên bêne guhertin û gavên pêwîst bêne avêtin.

Office of the Commissioner for Human Rights
Communication Unit

Tevayê raporê bixwînin:

<https://wcd.coe.int/ViewDoc.jsp?id=1511197&Site=CommDH&BackColorInternet=FE65B&BackColorIntranet=FE65B&BackColorLogged=FFC679>

EuroKurd News - eurokurd.net